



*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*



*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

## Tîrêjên Çarşembê

**Xelek - 53**

### Gelo Pêximber Îbrahîm Hûrî bû?

(beşê şeşem)

### Hin Agahdarî û Ronahîkirinên Dîrokî

Em li jêr hin agahdarî û ronahîkiriên dîrokî pêşkêş dikin û bawer dikin ku ew bi sûd û mifa ne ji bo pirsra me ya destpêkê: Gelo pêximber *Îbrahîm* Hûrî bû?

#### Hin agahdarî û ronahîkirin:

**Agahdariya yekem:** Navê *Îbrahîm* yê resen bi zimanê îbranî (*Abh-ram*) bû û bi zimanê erebî bi şêwazê "*Ebram*" hate nivîsandin, û wisa hate şîrovekirin ku tê maneya (Bavê nirxdar). Dema ku *Ebram* di nod û nehsaliya xwe da bû, yanê piştî vegera wî ji Misirê bo erdê Ken'an كنعان û piştî bûyîna kurê wî yê yekem Îsmâîl, Xweda jêva xuyabû û nav lêkir (*Îbrahîm*): {**Ji îro û pêva navê te ne Ebrame, navê te niha dibe Ibrahîm, ji ber ku ez te dikim bavê cemawerekî ji neteweyan**}. [*Sefer el Tekwîn, eshah17, ayet 5*]. Kîta "hîm" di zimanê îbranî da navdêr ji yekejimariyê diguhêre û dike gelejimariyê ji bo payedariyê. Nimûne (Îl / Îlohîm)<sup>1</sup>.

**Agahdariya duwem:** Ti dawer di jêderên dîrokî da, ne jî ti belge di zanistiya arkêologiyê da hene ku piştrast dikin *Îbrahîm* kesayetiyeka rasteqîn bûye, û ku ew xwediyê nasnameya pêximberî bûye wek ku di Cihûtî, Kirîstiyânî û Îslametiye da hatiye naskirin. Jêdera bingehîn û yekemîn ji agahdaryên wî ra *Tewrat* û *Telmudê*<sup>2</sup>.

**Agahdariya sêhem:** Li gor hin bûyerên ku di *Tewrat* û *Telmudê* da hatine, hin dîroknasan gotiye ku bi herhal *Îbrahîm* di dema navbera (1900 - 1700 b.z.) da jiyaye. Hinek din gotine ku bi herhat ew di navbera (1900 - 1850 b.z.) da yan jî di navbera (1940 - 1765 b.z.) da jiyaye<sup>3</sup>.

**Agahdariya çarem:** Agahdaryên derbarê *Îbrahîm* pêşî di *Tewrat* û *Telmudê* da hatine. Di pey ra di kelepura Kirîstiyânî da hatine, ya ku di warê dîrokî da li ser bingeha kelepura Cihûtî hatine avakirin, ji ber ku pêximber *Îsa* Îsraîlî bûye. Di pey ra agahdaryên derbarê *Îbrahîm* di kelepura Îslamî da xuyabûne; bi taybetî di *Qur'anê*, pirtûkên şîrovekirina *Qur'anê* û pirtûkên çîrokên pêximberan da.

**Agahdariya pêncem:** "*Heyama Kevin*" العهد القديم pirtûka Cihûtîyê ya pîroze, ew ji (39 Sîfran = babetan) pêktê. Ji pênc sîfrên pêşîn ra *Tewrat* tê gotin. Hin lêkolîneran gotiye ku pêkhatina wê hezar salî kişandiyê; ji destpêka heyama pêximber *Mûsa* da ji sedsala 13-an b.z. hema hema heyaya dawîya sedsala 4-an b.z. Ev tê wê maneyê ku di navbera heyama *Îbrahîm* û

*Mûsa* da dora şeş sedsal hene. Hinek ji wê baweriyê ne ku tomarkirina pêşîn ya esfarên "*Heyama Kevin*" di dema awarekirina Cihûyan ji aliyê Babilîyan va û koçkirina wan bo welatê Babil di sedsla 6-an b.z. da bûye<sup>4</sup>.

**Agahdariya şeşem:** Agahdariyên devkî yên ku bêjevan ji nifşekî bo nifşê din bi dirêjahiya 6 sedsalan derbas dikin - bi gelemperî - bi kêmkirin yan jî servekirinê ra, bi guhartin û badanê ra û jibîrkirina tiştên hûrik rû bi rû ne; yan jî hin tiştên din yên hûrik dikarin têkevin cihê wan ku pê cihên vala bêne dagirtin. Ev diyardeyeka naskirî ye ku kelepura devkî kevin ya pir gelan jê saxlem nemaye.

**Agahdariya heftem:** Zimanê *Îbrahîm* û yê êla wî ji zimanê *Îbranî* cuda bû, ewê ku bi wî kelepura ayînî cihûtî hatiye nivîsandin. Zimanê *îbranî* ew bi xwe zimanê ken'anî ye ku bi nivîsa aramî çarkoşe hatiye nivîsandin. Yên here pêşîn ku bi zimanê *îbranî* axivîne kurên *Ye'qob* (*Îsraîl*) kurê *Îshâq* kurê *Îbrahîm* bûne. Yanê nifşê çarem ji *Îbraniyan* zimanê xwe yî resen jibîrkirine û bi zimanê ken'anî axivîne<sup>5</sup>.

**Agahdariya heştam:** Di destpêkê da "*Heyama Kevin*" bi zimanê *îbranî* hate tomarkirin û hin esfarên wê yên biçûk bi aramî hatin tomarkirin. Di demeka pir zû da li zimanê *îgrîkî* (*yûnanî*) hate wergerandin. Ev tekstê *Îgrîkî* bi navê (wergera heftêyî الترجمة السبعينية) hate naskirin; ji ber ku wergera wî bi heftê û du wergêran ji êlên *Îsraîl* yên duwanzdeh (her şeş ji êlekê) pêkhat. Ev yek li ser daxwaza padîşahê Misirê yê *yûnanî Ptolemy II Philadelphus* (ji 283 heya 264 b.z. serdarî kiriye) pêkhat. Di pey ra "*Heyama Kevin*" di dawîya sedsala 6-an z. da li zimanê latînî hate wergerandin û di pey ra li zimanên din jî<sup>6</sup>.

**Agahdariya nehem:** Kelepura her ayînekê bi bingeha wê ya îdeologî va girêdayî ye. Bandora bingeha îdeologî ne tenha li ser raman, rêbaz شريعة û perestinan heye, belê bandora wê li dîrokê jî heye û dike ku ew bi wê ra bigunce. Çiqas bûyerên dîrokî bi rastiyê ra dijber bêne xuyakirin û çiqas efsanewî jî bêne xuyakirin, li ser yê bawermend erke ku bawer bike ew rast û duristin. Qet nayê bîra wî ku bipirse çawa wisa ye? Û çima wisa ye?. Heger wisa bike, ew tê maneya ku bawerîya wî kême.

Agahdariyên ku li ser navê *Îbrahîm* hatine belavkirin ji bandora îdeologiyê rizgar nebûne. Li gor "*Heyama Kevin*" peywirê *Îbrahîm* wisa bûye ku dapoyekê ji Xweda bistîne ya ku dibêje, Benî *Îsraîl* (senseleta *Ye'qob* kurê *Îshâq* kurê *Îbrahîm*) (gelê Xweda yê hîlbijartî) ye, û ku ew erdnîgariya navbera çemî *Nîl* li rojava heya bi çemê *Ferat* li rojhilat li ser navê wan dapokirî ye: {**Xweda bi Ebram ra peymabek bi'î ku dibêje: "Ji senseleta te ra ez vî erdî didim, ji çemê Misirê heya bi çemê mezin, çemê Ferat"**}. [*Sefer el Tekwîn, eshah 15, ayet 18*].

Di *Încîlê* da pêximber *Îbrahîm* pişt û pala pêximber *Îsa* ye di keftelefa wî da li dijî oldarên Cihûyan yên dijber ji wî ra. Li ser vê yekê *Îsa* oldarên Cihûyan tawanbar dike ku ew ji rêbaza *îbrahîmî* derketine û ku ew hatiye, daku vê yekê sererast bike. [*Încîla Metta, eshah 22, ayet 32, Încîla Johanna, eshah 8, ayet 32*]. Peywira pêximber *Îbrahîm* di Qur'anê da ewe ku bêjin: Cihû û Kirîstîyan ne ji alîgirên wî ne, û ku alîgirên rastîn pêximber *Mohammed* û Misilmanin: {**Îbrahîm ne Cihû bû, ne jî Kirîstîyan bû, belê ew Henîfî Misilman bû û ne ji duxwedawendan bû**} {مَا كَانَ إِبْرَاهِيمَ يَهُودِيًّا وَلَا نَصْرَانِيًّا وَلَكِنْ كَانَ حَنِيفًا مُّسْلِمًا وَمَا كَانَ مِنَ الْمُشْرِكِينَ} [*Sûreyê Alî Imran, ayet 67*].

**Agahdariya dihem:** Şopa gelemper di piraniya pirtûkên dîrokî da ewe ku navên erdnîgarî yên rastî hatine tepisandin û bincilkirin û bûyer bi navên nû va hatine girêdan. Ev şop bûye

sedem ku pir çewtî di warê dîrokî da peyda bibin. Vî tiştî di warê siyasî da jî hewş vedaye û wisa çewtiyên dîrokî bûne sedema peydakirina hin pirsgirêkên siyasî girêbend jî.

Wek nimûne li ser vê mijarê, ku piştî ketina padîşahiya *Mîttanî-Hûrî*, herêma nawendî ji welatê Hûriyan (herêma Cizîrê li rojavayê Kurdistanê û herêmên tenîştê wê bi hêla bakur da û bajarê Heŕanê jî di nav da) kete bin destê *Aşûriyan* û di pey ra bin destê *Aramiyan*. Li wir hin mîrîtiyên *Aramiyan* pêkhatin nav lêkirin (Memalik). Nivîskarên pirtûka "*Heyama Kevin*" bûyerên bi *Îbrahîm* va girêdayî birine ser erdnîgariya *Aramiyan* û ne ser erdnîgariya *Hûriyan*

Çarşemb, 30.03.2016

## Jêder

---

<sup>1</sup> Abdulhamid Zayed, Rojhilata Hemdem, rûpel 374.

<sup>2</sup> Qesîs Samûel Yûsif Xelîl, ketina dergahê heyama kevin, rûpel 111.

<sup>3</sup> Seyid Al Qimni, Pêximber Îbrahîm, rûpel 38. Muhemmed Beyyûmi Mehran, dîroka Ereban ya kevin, 1 / 352.

<sup>4</sup> Qesîs Samûel Yûsif Xelîl, ketina dergahê heyama kevin, rûpel 18. Ê li Ehmed Êbiş jî binêre, Al Talmud, rûpel 26. Jean Pottéro û hinên din: Rîjhilata nêzîk û şaristaniyên destpêkî, rûpel 21, nîşe 1.

<sup>5</sup> Muhyedin Subhi: Pergalên kesayetiya erebî, rûpel 11. Seyid Al Qimni: Pêximber Mûsa, rûpel 37.

<sup>6</sup> A.S. Migolinski: Nehîniyên Xwedawendan û ayînan, rûpel 336.